Xwendin bi zimanê Kurdî ye. Partiyên siyasî yên herî xurt, Kurdî ne.
Û em ji bîr nekin, pere jî diçin bêrîkên Kurdî (Ev Kurdistan e, ma Kurdistan çi ye).
Lê belê hingî ji me re xewn bû, em nema bawer dikin, anku em naxwazin êdî bawer bikin, û ev xewna tembel û bêkêr bi me xweş hatiye.
Li Bakur û Rojhilatê vî welatê payebilind û delal jî, hîn heya niha pêjna tu Kurdistanan nehatiye. Di ser ku ev serê çend salan e, amadekarî jê re tên kirin, û hin tiştên bi awayê xwe yên Kurdî-Kurdistanî çûne serî, û Bakurî di wan de baş bi ser ketine.
Hema bi kêmanî şaredariyên Kurdan di dest Kurdan de ne, û hejmareke pir baş ji pirtûkên Kurdî li wir tên çapkirin.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683

bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Zimanzanê Kurd Deham Ebulfetah:Eger min zanîbûya ku dê sûd jê hebûya, min ê yek bi yek bi helbestî ji wan re bigota”Rêya rewşenbîriyê ne ev e”.

“Deham Ebdulfetah ne ji asîmanan û ne jî ji nava sitêrkan derketiye; ew jî Kurdekî gundî ye û wekî hemî hevdemên xwe feqîr, hejar û perîşan bû.” Bi van çend gotinan, Deham Ebdulfetah xwe dide nasîn.
Di sala 1942’yê de li gundê Belê ku girêdayî devera Amûdê ye, ji dêya xwe bûye.
Di 6’saliya xwe de diçe bal melayê gund, da ku hînî Qur’anê bibe.
Tenê salekê li bal mele dimîne û xwendina xwe ya Qur’anê temam dike.
Lê di wê hingê de zimanê wî li awayê bilêvkirina bêje û tîpên Erebî, baş vedibe.
Paşê tevlî dibistana gund dibe.
Xwendina seretayî diqedîne û li dibistanên bajarê Hesekê xwendina navîn diqedîne, da ku paşê li zanîngehên Şam û Helebê xwendina Wêjeya Erebî û Mamostetiyê temam bike.
Di zaroktî û destpêka ciwaniyê de, ji hêla handêrbûna ber bi Kurdiyê ve, bandoreke mezin a melayên gundê Belê li ser Deham Ebdulfetah hebû.
Nemaze Mele Ehmedê Palo, dema ku li pêşber Deham Ebdulfetah destnivîsên xwe yên ferhengî û rêzimanî radixistin û li gel hevalên xwe yên mele diket di nava nîqaşan de, wê hingê ew rewş û seqa, xwesteka zanîna bi zimanê dayîkê, li bal Deham Ebdulfetah geştir dikir.
Destpêka geşta xwe ya nivîskariyê, Deham Ebdulfetah gotar û helbest bi zimanê Erebî dinivîsandin, lê paşê bi yek carê zimanê Erebî da aliyekî û tenê bi zimanê Kurdî nivîsand.
Piştî 8 salan ji xerîkbûna bi xwendina rêziman û ferhengên Kurdî ve, êdî Deham Ebdulfetah di sala 1989’ê de bi aweyekî fermî dest avêt pênûsê, da ku hest û boçûnên xwe bi Kurdiyeke resen li ser pelê bi cih bike.
Bi saya xebateke dûr û dirêj ku hetanî aniha jî berdewam e, Deham Ebdulfetah 12 berhemên giranbuha li pirtûkxaneya Kurdî bar kirin û aniha jî 3 berhemên wî li ber dest in.
Deham Ebdulfetah, dibêje ku tora çavên min êdî zerer gihayê û bi alîkariya xortan ez xebata xwe didomînim, lê belê belê dibêje ku “Dilê min xurt e. Moralên min bilind in. Herî kêm dikarim her salekê pirtûkekê çêkim”.

Hevpeyvîn:Ferîd Mîtanî



-Cenabê te li seranserî deverên welat bi xebata zimanzanî tê naskirin.Me dixwest destpêka geşta te di şopa zimanzaniyê de binasin?
Berî ku ez dest bi nivîsînê bikim, min pirtûkên rêzimanî yên hemî nivîskarên Kurd dixwendin, ji Mîr Celadet Bedirxan bigire hetanî bi nivîskarên dema îro...
Her rêzimaneke ku min dixwend, di cî de li ser lênûsa xwe min kurtebiriya wê dinivîsî, ji vê yekê bi hûrgilî min hemî nerîn, şîrove û têrmên wan dinasîn.
Tevahiya nivîskarên ku min berhemên wan ên rêzimanî xwendin, xebateke gelekî buha kirine. Ji ber kesê ku destpêkê rêyekê vedike, pir diweste û barê wî gelekî giran e.
Ewan şopa rêzimanê vekir, îcar dimîne ku ew şop hêj firehtir û xweştir bibe.
Bi xwendina min ji berhemên rêzimanî re, êdî hin bi hin ziman di devê min de şêrîn dibû.
Çi pirsgirêkeke rêzimanî li kû derê min bidîta, min serê xwe pê diêşand hetanî ku digiham rastiya wê.
Dixwazim wekî mînakekê bidim, Melayê Cizîrî di malikeke xwe de wiha dibêje**” Wer dilo da çin temaşaya ciwananên çimen”**
Min got ma çima Mele gotiye Ciwananên? Ciwan yekjimar e û komjimariya wê “ciwanan” an jî “ciwanên me” ye.
Min got ev pirsgirêkek e û ez li hemî berhemên ku dîwana Cizîrê şîrove kirine, geriyam, lê min tiştek nedît.
Îcar zêdetir ji mehekê min daye dûv vê meseleyê, hetanî ku di mejiyê min de berhev bûye. Di dawî de min nas kir ku di şêwezarê Soranî de kombêjiya navê “ciwan” li gel veqetandekê dibe”ciwananên”.
Bawer bike dema min rastiya vê yekê nas kir, wekî ku Kirîstofo Kolombos (Christophorus Columbus) Amerîka vedît. Ew qas ez kêfxweş bûm.
Bi vî rengî ez ji rêzimanê nêzîk bûm.

Berhevoka min a bi navê”Li Ber Dergehê Laleş”, yekemîn pirtûka Kurdî ye ku bi rêdan û destûra Wezareta Ragihandinê li Şamê hatiye çapkirin.

-Ji bo çi tu di domkirina şopa zimanzaniyê de rijd mayî û tişta herî zêde ku hêla tu tenê pabendî xebatên zimanî bibî, çi bû?
Destpêka ku min bi Kurdî nivîsand, min dîwaneke helbestan wergerand. Di pişt re min berhevokeke helbestan bi navê “Li Ber Dergehê Laleş” di sala 90’î de derxist.
Berhevoka min a bi navê”Li Ber Dergehê Laleş”, yekemîn pirtûka Kurdî ye ku bi rêdan û destûra Wezareta Ragihandinê li Şamê hatiye çapkirin.Ew jî bi saya dostê me Mihemed Ebdo Necarî bû.
Ez demekê li Erebistana Si’ûdî mam, paşê ez hatim welat û min dît ku 5 dîwanên helbestan derketine. Min hemî berhem xwendin û têbîniyên xwe li ser wan nivîsand.
Têbîniyên min dirêj bûn û min bi navê “Nerîneke Rexneyî li Helbestên Kurdî” êxiste pirtûk û di sala 1992’yê de, da çapê.
Ew jî bû yekemîn berhem di rexnegeriya helbestên Kurdî de.Ji bo min serkeftineke pir mezin bû.
Piştî van her sê berheman, ez derbasî biwara rêzimanê bûm.
Min dît ku her helbestvanek, her nivîskarek li gorî devoka dê û bav, jîngeh û herêma xwe dinivîse.
Min didît ku di yek kovarê de nivîskarek dinivîse “Di malê da” û yekî din dinîvse “Di malê de”. Ez baş lê sekinîm û min got wilê nabe.
Heman pirsgirêk di warê rêzimanê de jî her hebûn. Di berhemeke rêzimanî de “Paşkok” hatiye nivîsîn, di yeke din de “Qertafên Kesane” û di yeke din de “Lêkera Bûnê di Dema Niha de” hatiye nivîsîn. Min ji xwe re got ev mijareke gelekî giran e. Di zimanekî de rêgezek bi sê rengan tu carî nabe.
Ev paşkokên ku min destnîşan kirin, di hemî berhemên rêzimanê de hatiye ku tenê bi lêkerê ve têne nivîsîn, ji lêkerê pê ve bi tena serê xwe têne nivîsîn. Lê gelo çima dûr û çima nêzîk?
Ji bo naskirina rastiya vê yekê jî, min bi qasî 3 mehan lêkolîn kirine.
Evan kêşe û arîşeyên rêzimanî û rastnivîsînê, ez kişandim warê rêzimanê.
Ji vê yekê zêdetir jî, em tev gihane wê baweriyê ku zimanê me nasnameya me ya rasteqeîne ye, eger em zimanê xwe neparêzin, em ê li bir lingan herin.

Nivîsandina roman û çîrokan bi devokeke eşîrtî û xwecihî, nabe

-Nenivîsandina li gorî bend û rêgezên rêzimanê, çi bandora wê ya neyînî li ser bipêşveçûna tevgera wêjeyî heye?
Wêje bi zimanê devkî jî hatiye nivîsîn.Mem û Zîn bi xwe jî ne bi zimanekî sade Kurdî hatiye nivîsîn, anku bi gelek zimanên têkel hatiye nivîsîn.
Lê zimanekî ku tu serê xwe pê bilind bikî, divê ku şaşiyên te gelekî kêm bin û tu şêwezarên din jî di ber çavan re bigirî.
Xebata ber bi yekbûna ziman ve gelekî pêwîst e. Ew hizir û armancên avakirina welatekî, nava şûv û beyaran.

Zimanekî bi hezarên salan e ku em jiyan, debar, bazirganî û tevgera xwe pê dikin, gelo rast e ku rêzimana wî tenê 300-400 pel e?

-Te gotibû ku “tenê helbest têra danasîna navnetweyî nake”. Eger hêj bêhtir tu vê yekê şîrove bikî..?
Rast e.

pêwîstiya xwe bi zimanekî di asta wan armancan de heye.
Nivîsandina roman û çîrokan bi devokeke eşîrtî û xwecihî, nabe.
Ma dibe tu gotarekî binivîsî û hevalekî te ji Bakurê Kurdistanê jê fêm neke?
Aniha li milê we Aşîtan, di dema niha de tîpa “ê” bi dawiya lêkerê ve dikin û bi vî awayî berhem jî nivîsîne; wekî mînak: dixwazê, dibê û hwd...
Îcar min carekê ji Rezoyê Osê re got ma ev çi “ê”ya devokî ye ku Aşîtiyên te bi dawiya lêkerê ve dikin?
Ji min re got:”Dev ji wan berde, şaş e û hew”.
Dixwazim bibêjim ku rêziman, wekî rêyeke rast û xweş di nava beyarekî de ye; kesê vê rêyê bişopîne bi hêsanî bi rê ve diçe, kesê ku neşopîne, divê ku bide Navnîşana her miletekî, zimanê wî ye.
Zimanê te yî neteweyî, navnîşana hebûna te ya komelgehî ye, ne jî yê hebûna kesayetî ye.
Gotina ku dibêje zimanê neteweyî, nasname ye, divê ku dawerive mejiyê mirov û bimeye.
-Di babetên rêzimanî û rastnivîsînê de, Deham Ebulfetah ne hişk e?
Şaşîtî û sivikirina ku ziyanê negihîne têgeh û wateya gotinê, ez tu carî tê de ne hişk im. Aniha ya rast ew e ku mirov bibêje:Ez ji Amûdayê me.
Lê madem ku tu dibêjî: Ez ji Amûdê me. Û ji hêla wateyê ve tu ziyan tune, ne pirsgirêk e.
Lê dema ku tu gotinekê sivik bikî û tê de ziyanê bigihînî kok û wateyê, di vir de nabe.

Yek ji mercên sereke yên gorankarî û sivikirinê ew e ku, ziyan negihe wateyê.
Ziman jî wekî hemî giyanewran xwe nûjen dike û di gera gorankariyê de cihê xwe digere.
Lê dixwazim tiştekî destnîşan bikim. Gelo rast e ku rêzimana Kurmancî tenê di 300 rûpelan de ye?
Mîr Celadet Bedirxan û Reşîdê Kurd di dema xwe de tiştekî baş û mezin afirand, lê nabe ku rêzimanzanên îro xwe bi dema wan bipîvin.
Zimanekî bi hezarên salan e ku em jiyan, debar, bazirganî û tevgera xwe pê dikin, gelo rast e ku rêzimana wî tenê 300-400 pel e?
-Der barê hemî şax û zanistên zimanî de te lêkolîn kirine û berhem dane...Her zimanek nasname û taybetmendiyeke xwe heye, nasnameya Zimanê Kurdî çi ye?
Di zimanê Erebî de gotin ji hevdu dizên, tên dariştin.
Zimanê Tirkî pevzeliqandî ye.
Zimanê Kurdî jî, zimanekî hevbend, lêkdayî û hevedudanî ye.
Zimanê Kurdî ferhenga xwe ya derbirînê, ji lêkdana du-sê gotinan bi hev û din re, werdigire.

Zeynulabidîn Zinar dibêje ku Cegerxwîn li ser welatparêziyê nenivîsiye. Malikavayo! Hikmet Cemîl ji bo sitrandina helbesteke Cegerxwîn, cezaya bidarvekirinê lê hat birîn.

-Der heqê jiyan û berhemên Cegerxwîn de, herî dawî nivîskarinan xebata Cegerxwîn bi neyînî nirxand. Ji bo vê yekê tu çi dibêjî?
Hîna Kurd negihane wê astê ku rexnegêr bin. Mirovê Kurd jî hêj rexneyê napejirîne.
Kilîta rexneyê ya sereke ew e ku tu kesayetê deynî aliyekî, û berhemên wê kesayetê deynî aliyekî din. Li vir, tu yê Cegerxwîn rexne bikî, yan jî kesayeta wî?
Eger tu bixwazî Cegerxwîn binirxînî, divê ku tu hemî berhemên wî li pê hev rêz bikî û bi hûrgilî bixwînî, da tu bizanî asta wî ya hunermendî û welatparêzî çawa ye?
Cegerxwîn tolaz e yan na, Xwedênenas an na û Nimêjker e yan na, te tu têkilî bi wê yekê nîne.
Zeynulabidîn dibêje ku Haco du gund dane Cegerxwîn, û Cegerxwîn yek ji wan gundan firot û pê bazirganî kir. Dema tu vê gotinê bibêjî, divê te lêkolîn kiribe, ne ku te bi devan bihîstibe.
Zeynulabidîn bi vê yekê barê xwe giran dike.
Mala Haco bihostek erd nedaye Cegerxwîn.
Cegerxwîn ji malekê, maleke din kirê dikir.
Mirovekî Fileh bang li Cegerxwîn kir û gotê lawo tu helbestvanê Kurdan î û parçeyekî erd dayê. Ew erd ava kir û aniha gorna wî her li wî erdî ye ku bûye mala wî.
Zeynulabidîn Zinar dibêje ku Cegerxwîn li ser welatparêziyê nenivîsiye. Malikavayo! Hikmet Cemîl ji bo sitrandina helbesteke Cegerxwîn, cezaya bidarvekirinê lê hat birîn.
Ez û Zeynulabidîn Zinar hev nas dikin. Em dikarin gilî û gazinan ji hev bikin.
-Li gorî şopandina te, birêveçûna tevgera wêjeyî li Rojavayê Kurdistanê bi çi hawî ye?
Eger civaka wêjeyî dûr ji nakokiyên rêxistin û siyasetmedaran bûya, dê pêşdetir biçûya.
Her wisa dê çêtir ji hev hez bikirana.
-Di dema îroj de, çi projeyên te hene û tu çi xebatê dikî?
Aniha 3 pirtûkên destnivîs li ber destên min in.Ez li ser wan dixebitim, lê naxwazim gelekî li ser wan biaxivim.
Ez jî wekî mirov, gelekî dixwazim wêjeya cîhanî bixwînim.
Zêdetir ji dehên caran e ku ez Çarînên Xeyam û Dastana Gilgamêş dixwînim û ji wan têr nabim.

Ez ê çawa venegerim Rojavayê Kurdistanê. Wilehî ez xebata xwe li vir dikim û ruhê min li Rojava ye.

-Ev heye çend sal ku tu li Bakurê Kurdistanê bi cih bûyî, gelo tu yê venegerî Rojavayê Kurdsistanê?
Hatina Bakur ji bo min gelekî baş bû.
Bû derfetek ku ez li xwe vala bibim û aniha zêdetir ji 7 se’etan ez li ser maseyê dimînim.
Ez ê çawa venegerim Rojavayê Kurdistanê. Wilehî ez xebata xwe li vir dikim û ruhê min li Rojava ye.
Ez bi çûna Ferhadê Içmo gelekî êşiyam.
Rojek di jiyana min de mabe ez ê vegerim. Dikarim bibêjim ez ê Newrozê li Rojava bim.
-Banga we ji rewşenbîr û civata nivîskaran re çi ye?
Eger min zanîbûya ku dê sûd jê hebûya, min ê yek bi yek bi helbestî ji wan re bigota”Rêya rewşenbîriyê ne ev e”.
Her çi qas nêrînên we ne yek jî bin, lê her armanca we yek e.
Bi van nakokiyan em ê negihin tu armancan.
Bar giran e, divê mirov li xwe vegere.
Rewşenbîrî ne ew e ku ez helbestekê ji çend kesên nezan re bixwînim, lê belê, divê ku em xwe bi wêjevanên cîhanî bipîvin.
Mixabin, ez bêhêvî me. Heyanî sibe ez bêjim, ne gotin diqedin,

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App 00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Belawelabûn

Devliken Kelogirî

Ev serê panzdeh rojan e min lêvên xanimekê tahm nekiriye.
Ez bi xwe zanim, wexta bi ser panzdeh rojan dikeve, wek tirimbêla bêbenzîn li min tê; sar, bêdeng, cirnexweş, hêrsokî, agresîf û aciz...
Û deng û pêjna kesekê jî nedihat.
Min berê xwe da mesincerê(Messenger), min got hela ka bê silavek-kelamek ji xanimekê tune ye. Min li deriyê mesengerê kir gurmînî; çend peyam hatibûn, lê ji navên wan xeyal tevizîn, hêvî şikest.
Ji ber ku ji peyamên hatibûn navekî mê tune bû, min jî eletexmîn ji yekê dest pê kir.
Ferîd Mîtanî, Sernivîserê Buyerpressê peyv bi peyv weha nivîsiye:
"Seyda, bila hemî demên we xweş bin!"
Ji mêj de ye ji meseleya "we-hûn"ê aciz im.
Ew ciwanik-ciwamêrên ji bo qîmet-xatir-hurmetê ji dêvla "te-tu"yê "we-hûn" bi kar tînin, bi mentiqa zimanekî din qîmet-xatir-hurmetê didin kesên li hember xwe, lê berevacî vê, zimanê xwe jî bê qîmet, bê xatir, bê hurmet dikin.
Axir, ez vegerim ser mijara xwe û Ferîd.
Nuha Ferîd ê bibêje, "Meriv ji Ereban re nebêje merheba"
Lê ez ne Ereb im.
Belê, Ferîd piştî wê silav û demxweşiyê ji min daxwaz kir ku ez ji bo wan nivîsekê binivîsim.
Ez fikirîm û fikirîm û dîsa fikirîm...
Ez bawer im, li ser Ferîd, bibore li ser daxwaza Ferîd ji min daxwaz kiribû, nizanim çend kêliyan fikirîm, lê baş zanim, ez baş fikirîm.
Min got, "Ferîd heyran, ev serê sê-çar mehan e li Mêrdînê me û ji ber mêrdîniyên ne biaqil û ne dîn, ez jî bûme nîv biaqil û nîv dîn. Tevî vê nîvbiaqilî û nîvdînîtiyê ez hin karên biaqilane ji bo biaqilan dikim.
Nuha haziriya kitêba xwe ya nuh dikim.
Her ji çend rojan, bi dor;
ji Lotikxaneyê re dinivîsim,
ji Rîataza re dinivîsim,
ji Rewanbêjê re dinivîsim.
Ka ji birayê xwe re bibêje, ez çi bikim?"
Ferîd sekinî, sekinî, sekinî û gotineke dîrokî kir.
Got, "Seydayê Devliken, hey maşale!"
Ma dibû piştî vê maşaleyê min ji vî xweşmêrî re bigota na?
Jixwe min jî negot na.
Lê min ê çi binivîsiya?
Haa! Berî jibîrkirinekê, ciwamêr şertek jî da ber min. Lazim bû gotinên nivîsê ne kêmî şesedî û ne jî zêdeyî hefsedî bûna.
Ma nizam, ev gotinên li jor min kirin jî dihesibin?
La hewle wela!
Meriv ji yekî bêsînor daxwaza bi şesed-hefsed gotinî hûnandina mijarekê bike.
Îja carinan mijar ji mijarê dizê.
De ka ez bi mijarekê xwe li nav mijaran biqewimînim.
Bismilahûrehmanûrehîm!
Mijar Yek:
Xwendin baş e, lê divê meriv ji xwendina xwe fêhm bike.
Xwendina ku tesîrê li dilê te, li hestên te, li nêrîna te, li kesayet û helwesta te neke, ew xwendin ne xwendin e, himaltiyeke beradayî û quretiyeke megalomanî ye.
Û mixabin, pirê "zane"yên me tenê dixwînin; dil, hest, nêrîn, kesayet û helwest bi ber bayê xwendinê-zanînê nakevin.
Û çi tê serê vî miletî, ji ber van xwendeyên nexwende tê serê vî miletî.
Divê sîstem an civak an desthilatî ne robotan, însanan biafirînin.
Bawer im, ji ber kontrola robotan ê di destê meriv de be, heger meriv bixwaze robot jî kare ji van xwendeyên nexwende baştir bin.
Mijar Dudu:
Xwezî her kesî karê xwe bikira.
Wek nimûne:
şivanan şivantî,
gavanan gavantî,
muxtaran muxtarî,
hunermendan hunermendî,
nivîskaran nivîskarî,
siyasetmedaran siyasetmedarî,
jinan jintî,
mêran mêrtî bikiraya.
Û serê civakê bi kultureke bermeqlûb tev li hev nebûya.
Mijar Çar:
Kesên durist û dilsoz ji desthilatdariyê pirrrr dûr in.
Û heta durist-dilsoz neyên ser text, Kurd nabin xwedî bext.
Û bext jî nebe, text textik e.
Û textik jî ji bo çend kurtêl nan tim di firneyan de dişewitin.
Bext...
Text...
Textik...
Mijar Pênc:
Îmaj û terza min.
Her ji du-sê rojan carekê ez porê serê xwe didim ber jilêt û gwîzanê.
Ez nahêlim tayên por serê xwe rakin.
Serîhildana por, ez bi terzeke stalînîst û bi hişmendiyeke hîtlervarî têk dibim.
Lê hêdî hêdî zivistan tê û di serma û seqemê de serê rût û zelût ne karê aqil e.
Lê dil heye li hember serma û seqemê bi serê rût û zelût serî hilde.
Berxwedan,
serhildan jiyan e hey hey,
serhildan jiyan e...
Mijar Şeş:
Navê Xwedê û pêxember xweş!

Giyayê Hewşê Tehl e

Nuhman Osman

Dîmenekî normal e, li her taxekê ji yên welatê me, li serê her kuçe û zaboqekê tu yê çend xortên me, rûniştî bibînî.
Îcar heger hin keçên me yên "bêşens" wê gavê di ber wan re biborin, bê guman dê ew keç gelek gotinan ji wan bibhîzin; mîna: "rihê minê", "wey ez li ser te bigerim", "ax, xwezî bavê te bibe apê min" û hwd.
An jî li nava dar û aviyan, tu yê çend gênc û ciwanên me bibînî ku qewsik di dest wan de ye, û Xwedê ji dêya wê çûkê an jî kevokê sitandiye eger bikeve ber nîşana wan.
Ez ê bi kurtebirî mînakan bidim û gelekî dirêj nekim. Her li welatê me, her yek ji me gemar û qirêja xwe dûr ji malê diavêje, da ku pêşber û dorhêla mala me nelewite, ji ber ku li gorî dîtina me ya teng, tenê mala me welatê me ye; lê quncikên ku em ji xwe re dikin sergo, ew ne welatê me ye!...
Heman kesê ku ev kêferat li welatê xwe dikir, dema koçberî welatekî Ewropayî bû, bi dest xwe re hat guhertin; lê ne guhertineke ji dil, belê, guhertineke xapînok…ji tirsa ku wî ji welatê xwe dernekin, êdî ew jî wekî wan tevdigere.
Li bîra me tevan e dema ku di şeva sersalê de hejmarek ji kesên biyanî der heqê keçên Elmanî de bêexlaqî û destdirêjî kirin, di wê hingê de xortên ewan zaboq û kolanên welat, daketin cade û kolanên Elmanyayê û gurzên gulan didan keçên Elman, da ku şaristanî û qenciya xwe diyar bikin.
Di hin wêneyên ku li pelên facebookê tên belavkirin de, em dibînin ku ew xortên dar û aviyan, wêneya xwe li gel teyrik û ajalan kişdandiye; lê nêzîkbûna wan ji teyrikan re ne wekî nêzîkatiyên li welat in, wan teyrikan nakujin!
Heman xort, çawa ku li çavên xwe miqate ne, wilê li paqijiya kolan û zaboqên Ewropayê miqate ne.

Pirsa herî mezin ew e...
Gelo ji ber çi di welatê xwe de em li başî, qencî û paqijiyê bi xwedî dernakevin, lê li welatên biyaniyan ku tu caran nabin welatên me, em dibin wekî Pêxemberan?
Bi nerîna min, bersiva vê pirsê gelekî fireh û dilsoj e.Lê ji beriya her tiştî divê ku ez çend xalan rêz bikim:
1-Behweriya me bi kesayeta me pir lawaz e û em her timî welat û miletê Rojavayê Cîhanê wekî mînaka her tiştên baş dibînin... Lê em ji bîr dikin ku welatê me(Mezopotamya), landika jiyan û şaristaniyê ye.
2-Hezkirina me ji welêt re tenê bi ziman e. Yan jî, em xwe nabînin xwediyên vê xakê û vî asîmanî; sedema vê yekê jî ew e, ku desthilatdaran têgeha welat wekî navekî bêwate hişt û tenê warê me bûbû qada sitem û diziyê...

Di vê babetê de, gelo me ji xwe pirsiye ka em kî ne?
Û ka rola me di jiyanê de çi ye?
Heger em li erdnîgariya welatê xwe binihêrin, em ê bibînin ku bihtirî wê çiyayên bejinbilind in…hebûna van çiyayan, ne ji valahîkê hatiye..
Xwedê Te'ala di Qur'ana Pîroz de, di Sûreta Israa de pesnê Kurdan dide gava ku dibêje..."قوم أولي بأس شديد"..
Anku pir bihêz in û ev hêz û paya wan ji hêz û bilindiya çiyayan hatiye..ji ber vê yekê gerek em lêkolînên nû û xurt çêkin, da ku em dîroka xwe ya windayî ji bin kavilên zordarî û sitemkariyê derxînin.
Jixwe diyar e ka çi qas rola xwendin û perwerdeyê di avakirina insanan de heye, da ku êdî ew insan bi kesayet û bilindiya welatê xwe bawer bin.
Ji lew re, çareserî ji dibistanan dest pê dibe, da ku nifşên nû li ser hezkirina welat bi xwedî bibin û bizanin ka çi qas Kurd kevnar û xwedî dîrokeke dagirtî ye.
Divê neyê jibîrkirin ku ji hemî saziyan tê xwestin ku têkevin di xizmeta milet û welatê xwe de û ji hemî rengên sitem û desthilatê dûr bin, da ku di mejiyê me de heyvanekî sade ji işqa welat bimeye.

Dewlemendên Parsek

Behzad Dawûd

Çawa ku berfa giran bo bav û bapîran dîrok û amaje bû, koçberiya bi kom a 2015'ê jî, dê bibe dîrok û amajeyek bo zar û neviyan. Her koçberek çîrok û serpêhatiyeke wî heye, nexasim dema derbaskirina Deryaya Îce ku di nava qeyikên plastîk de bêhtir ji 10 malbatên ji ol, netewe, civak û welatên cuda bi egera yekçarenivîsê diciviyan, binav bûn.
Lewma piraniya wan, pirtûkên xwe yên pîroz di paşil an jî di buxçikên xwe de dihilanîn; ji bilî bangên tirsê yên "ya Allah û ya Xwedê."
Yên bêol jî xwe dida nasîn, lav û tika ji Yezdanê xwe yê perwerdegar dikir ku wan çend demjimêran biparêze.....
Bi giştî, tevahiya wan Xwedênasan soz didan ku piştî lingên xwe li ser bejahiyê danin, dê ew qas alîkarî û diyarî bo hejarên li pey wan mayîn terxan bikin; lê beşê herî mezin ji wan, bi avêtina êlekan li ber qiraxa deryayê re; soz û peyman, û dibe ku ol jî avêtin ser qûma qeraxên Îce.
Xort û zilaman rihên xwe kur kirin. Simbêl jî yekser li gel cil û bergên ku gemara her deh welatan li wan girtibûn, avêtin.
Kom bi kom berê xwe dan serşokan, lê ji ber nezanîbûna bi çawaniya karkirina alavên serşuştinê, peywendî bi wergerên ziman ên li kampan kirin da ku wan hîn bikin. Jin jî, heman tişt..
Wê maweyê dirêj nekir. Saziyên wan welatan êdî li gora prensîpên nîştecîkirinê ku her endamek ji malbatê dibe xwedan odeyeke taybet, dest bi dabeşkirina xaniyan bo wan malbatan kir.
Piraniya wan, an jî 95% di xaniyên pak û temîz de bi cî bûn, û bûn xwedan kertên bank, saxlemî, veguhastin û hwd…
Di rewşa nuh de gelek diyardeyên rojhilatî yên kevneperest, serî rakirin û bi taybet der barê fişara li ser jinê û bazirganiya bi keçan.
Berovajî wê jî, degelbûna jinan û xwepiştgirêdana bi yasayên Ewrupî bo armancên nepak. Nimûneyên zindî pir in.
Hene ji wan ku tenê piştî gihiştina xwe bi çend rojekî, xwe ji zilamê xwe cuda kirin. Hene bo dema çend mehan zilamên xwe bi hêza yasa ji malên xwe der kirin û niha li kampan bi cih bûne....Li beramber jî, zilaman çavên xwe berdan derveyî malan, ked û azarên jinên xwe ji bîr kirin ku bi salan li jêr xanîkên kavil û tim dilop de, jiyabûn.
Ev diyardeya xerab mîna nexweşiya penceşêrê di civaka penaberan de belav bû; bi taybet Sûrî, çi Kurd, çi Ereb û ya diltezîn ew e ku rêjeya pir a pirsgirêkan li ser bidestxistina kerta diravê zarokan e.
Duyemîn diyardeya xerab, zarok û zimanê dayîkê ye:
Ya balkêş ew e ku zarokên Kurdan ên ku ev salên dirêj in li van welatan ji dayîk bûne , bi Kurdiyeke parzûnkirî ji tîpeke biyanî, diaxivin..Berovajî wê, zarokên penaberên nuh bi zimanê welatê nuh diaxivin û bi piştgîriyeke tijî hovitî ji dê û bavan .
Behaneya pûç jî, heman behaneya malbatên Kurd li Heleb ,Hums û Şamê ye "Bila hînî ziman bibin da ku jiyana wan hêsan be".
Diyardeya din a xirab, zûxwejibîrkirin e:
Piraniya penaberên nuh ji bin kon û tenekên kampên Başûr û Bakurê Kurdistanê ne. Yê rewşa wî herî xweş ji wan, di kavilekî de kirêçî bû, yan ji mala xwe ya bê av, kehrebe û sûtemenî reviyabû.
Û beriya hatinê berdewam temaşevanê kenalên ragihandinê bû, bo naskirina çawaniya rêkên koçberiyê, zanyariyan werbigre...
Lê bi dîtina xweşî û aramiyê, êdî xwe nabîne ji wî gelî û eger raportekê li ser kampa xwe ya berê dibîne, yekser li kenaleke din temaşe dike.
Ne tenê wisa , mixabin dema ku Kurdistan di bin gefa nemana bi yek carê de be, ji koma sedhezarên Kurd (Yên nuh), tenê 500 an 1000 kes di çalakiyekê de amade bibin û ji wê komê jî 50 ta 100 kesan rûdiyar bin li hemû çalakyan…ev yak jî cihê daxeke mezin e.
De binêrin li diyardeya hew jê erzantir:
Bazara jinan geş bûye û nirx her ber bi bilinbûnê ve ye.
Keç bûye derdê bav û dê (Xwedê giravî), çimkî azadî berfireh e û sînordanîn bo keçan zor e.
Lê dema daxwaza wê keçê bo şûkirinê (Zewac) dibe, yekser malbat bazarekê mîna firotina ajalekê vedike û bi diravekî yekcar zor, difroşin. Nirx jî ji 30 hazar Yoro ta 50 hezarî ye.
Di dûmahiyê de rêjeya nerênî bi ser ya erênî ketiye û mîna hemû pêkhateyên din ên Rojhilata Navîn, Kurdê li wan welatan qet venagerin û ev pêşbînî rastiyek e.
Çawa Kurdistan warê bav û bapîran bû, Ewrupa jî dibe warê zar û neviyan.
Û tiştên ku xelkê ji girêdana bi axa bavan ve girêdidin, roj bi roj ber bi jinavçûnê de ne.
Ji ber wê yekê, em ê her dem di pratîkê de bêdewlet, der bi der û riswa bin; û di mejiyê xwe de bi çend diravekî ji alîkariyan, dewlemend bin.
Em in Dewlemendên Parsek.

Geyakên Çol û Beyaran…Ên Ku Têne Xwarin

Dilovan çeto

Civaka Kurdan û bi taybetî kesên ku li gund û zozanan dijîn, bi hin dab û nerîtan zengîn in; çi ji aliyê bihurandina şevbuhêrkan ve be, û çi ji aliyê leystok û hin tiştên din ên mîna metelok, mamik û zûgotinên ku şevên zivistanê yên dirêj bi wan derbas dikirin ve be.
Ji aliyekî din ve, mitbexa Kurdî jî ji aliyê çêkirina xwarinên cûr bi cûr û xweş ve navdar e. Û jina Kurd bi çêkirina xwarinên xweş û cuda, hatiye naskirin.
Her wiha sifreya malbatê û bi taybetî di demsala buharê de, bi çêkirina xwarinên ku ji hin cûreyên geyakên li çol û beyaran şîn tên, tê xemilandin.
Bi dehan cûreyên geyakên ku bi xavîtî yan jî kelandî têne xwarin; li zozan, zevî û daristanên Kurdan hene.
Demsala buharê wekî Bûka Salê tê naskirin, her wiha ji piraniya malbatan re (Nemaze yên feqîr û xizan) demsaleke taybet e, çimkî xwarinên ku ji geyakên çolê têne çêkirin, sifreyên piraniya malbatan dixemilînin.
Ji aliyekî din ve û wekî em dizanin, nêzî 80-90 % ji dermanên nexweşiyan, ji geyakên çolan têne amadekirin…ev yek sedemeke sereke ye ku dihêle kesên li gundan dijîn, tendirustiya wan ji ya kesên ku li bajaran dijîn, baştir be.
Geyakên herî navdar li cem Kurdan ku di buharê de şîn tên û herhata xelkê li ser wan heye, çend cûreyên xuyayî û naskirî ne; wekî: tolik, sitrîzerk, ginêber (qinêber), kereng, kelbeş, xerdel, sûrim, kumik, gwîriz û hwd...
Ji aliyê tendirustî ve, gelo mirov çi sûdeyan ji geyakên çolan werdigire?
Em ê li ser du cûreyên geyakan bisekinin; ew jî Tolik û Geyakê Kelbeşê ne.
Li gorî zanyariyên pizîşkî, ji bilî sûdeya xwarina Tolikê, der barê tendirustiyê de jî mirov dikare gelek sûdeyan ji pelê Tolikê wergire, wekî:
1-Rawestandina êşa gewd û bi taybetî di dermankirina birînên çerm de, çimkî pelê Tolikê bi hin vîtamînên ku dikarin êşê rawestînin, zengîn e.
2-Bihêzkirina endamên parastinê di gewdê mirovan de.
3-Pelên Tolikê ji bo devlêkirina kêzikan, şewata tava rojê û birînên çerm jî, tê bikaranîn.
4-Geyakê Tolikê rehên pişik û bêvilê ji gemarê paqij dike û iltîhaba qirik û zengelorê, kêm dike.
5-Pelên Tolikê bandoreke baş li qermîçonkên rû dike.
6-Dema ku pirsgirêkên hêrandina xwarinê di mîdeya mirovan de çêdibin, geyakê Tolikê alîkariya gewd dike û xwarina di mîdê û roviyan de, ruhin dike.
7-Mirovên ku xem û derdan dikşînin û bêxewî li cem wan heye, ava kelandî ya Tolikê alîkariya wan dike û dihêle ku bi hêsanî razin.
Her wiha geyakê Toilkê nexweşiyên dev, diran û rebû jî derman dike.
Geyakê diwemîn ku di civaka Kurdî de navdar e, geyakê Kelbeşê ye.
Geyakê Kelbeşê di destpêka şînbûnê de, di nava hin geyakên din yên wekî: tolik, sitrîzerk û xerdelê de, tê kelandin. Paşê di nava zeytê yan jî rûnî de tê qelandin û li ser sifreya malbatê xwarineke xweş e.
Lê xwarina herî xweş û bi nav û deng, dema geyakê Kelbeşê şîn tê û mezin dibe, wê çaxê qorata wê ku bi navê qîfaran tê naskirin, cihekî taybet li cem xelkên Rojavayê Kurdistanê digire.
Ji aliyê tendirustiyê ve, pisporên pizîşkî diyar dikin ku Kelbeş dermanê ceger e.
Çimkî xwarina Kelbeşê û bi taybetî dema ku mezin dibe û seriyê wê sitrî digire, ceger paqij dike…her wiha nexweşên penceşêrê yên ku dermanên etonomî (kîmawî) bi kar tînin, xwarina kelbeşê alîkariya wan dike û bandora wî dermanê etonomî, li ser wan sivik dike.
Ji aliyekî din ve, geyakê Kelbeşê şîrê dayîkan zêde dike û nexweşiya ba (romatîzmê) derman dike.
Ji bilî her du cûreyên geyakên navbûrî ku sifreya Kurdan di demsala buharê de dixemilînin; bi dehan geya, gul û kulîlkên rengereng û bisûde di kultûra Kurdan de peyda dibin.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Helbestine Bijartî...Cîhan Hesen

Bi awirên wan çavan
Min nekuje
Li ser reşkên bijankên min
Girava evîna xemkulî ava neke
Dûr be
Di newalên miçiqî de
Awazên evînê nerêsîne
Naxwazim ez û evînê
Hîn zêde biêşin
Ku xulekekê jiyan sekinî
Û para me di wê xulekê de hebû
Min di kendalên evînperestîya xwe de veşêre
Û destên min bernede
.....

Cîhan Hesen, xelka Kobanê ye lê jidaykbûya gundê Ferîqan ê Serê Kaniyê ye.
Di 1996'ê de çavên xwe li jiyanê vekirine.

NIZANIM
Nizanim agir e yan av e
Nizanim tav e yan baran e
Nizanim zivistan e yan buhar e
Nizanim xew e yan xeyal e
Nizanim bêrîkirin e yan jibîrkirin e
Nizanim evîn e yan nefret e
Lê ya ez dizanim
Tu yî
Û dil li te digerî
Û biêş dizivirî
Bes tu li ku derê yî
Nizanim
.....
Helbesta min bê ûd bûye
Helbesta ku min
Di paş mijdûmana
Ewrên hestên te de
Nivîsandibû
Îro dema tu di wê mijdûmanê de
Di ber helbesta min re derbas bûyî
Te, ne ez
Û ne jî helbesta min dît
Tevî ku hest
Bi navê te jan vedidan
Û min jî bi tîna hatina te mij dikuşt
Lê dîsa wek her carê
Te çavên xwe
Ji dîtina min girtin
Û helbesta min
Ji xemsarîya xwe bê ûd kir
.....
Evîna te ziranekî bibanî ye
Te li ser dilê min daniye
Ger te evîna xwe rojekê rakir
Û barê dilê bê ûmîd giran kir
Giyanê min ji te re dîyarî ye
Evîna te guleke biistirî ye
Te li ser dilê min de çandiye
Ger te rojekê stirî di dil çik kir
Û bihna gulê ji ser dil rakir
Xwîna min ji te re lehî ye
Çavên kilkirî jî
Ji tarîtîya dilê xembar re ronahî ye
Ev e evîna te
.....
.....
Ger tu çûyî
Helbesta min bi xwe re
Bibe
Û hemî hestên evînî jê daweşîne
Êdî para hestên min tê de
Namîne wê demê
Û malik bi malik
Bila ew evîn ji dilê
te veqete
Evîna min jî di nav wê de
Malevanî bi destên xwe de
derxe
Eger bibe jî

Yan nebe
Jiyana min
Di wê kêlîyê de bila biqede
Jixwe dizanim wê
Hêvîyên min bi perikên şikestî di esîmanê
Welatê min de bifirin
Çavên min di dê çûyîna te de dê
Kor bibin
Ger tu çûyî,
li ser evîna min nelorîne
Êdî evîna te ji bo min kîn e
.....
Di nav rêzên tayên porê
Rojê yên zêrîn de
Kezîyên te dihunim
Û çavbelekîya te
Di sibehîya berbanga rojê de
Xweşik dibe
Li çavên min
Dîtina rûyê te
Di pencereya odeya min e
Xemgîn de hawirdorê
Şadiyê li min diweşîne
.....
Şeva ku
Ez li ser awazên evîna te bi heyvê
Şa nebim
Di wê şevê de ez
Ez gunehkarê esîmanê welatê xwe me
Û nemafdar im ku
Te roja din bibînim
.....
Min dixwest
Di kêlîya dîtina te de
Xwe bigihanda quntaza
Guliyên te
Û gulbeybûnên welatê xwe
Tê de girê bida
Di nava tofana wê
Xwelihevşaşbûnê de
Di qireksînga te de
Agirê hezkirinê hêdîka
Bitemranda
Lê ez çi dîn bûm
Bê tevdîr bûm
Ji min nehat
Ku min xwe di hembêza te ya
Bikeder de bipêça
Û min şerbeta meynenoşê
Di nav tasikên destên te de
Dabiqurtanda
.....

Hetanî bi Bakaloryayê xwendina xwe didomîne, lê di pê Şoreşa Rojava û vebûna dezgehên ziman û wêjeya Kurdî re, êdî di biwara çand û wêjeya Kurdî de xebatên xwe didomîne.

Ku çirûskên bêrîkirinê
Di nav dilê te de
Pijiqîn
Berî ku laşê te
Di nav agirê xwe de
Bişewitîne
Û dûmana tenêtîyê
bi bîra te bîne
Hinekî
Di nav kolanên bajarê min
De bisekine
Raweste
Bê deng be
Û solixeke kûr
Bikişîne
Pê re
Janên bajarê min
Bihn bike
Ew bihn
A porspîbûna min e
.....
Şivanê şevê
Şev di reşahîya xwe de
Li benda hatina te ye
Ez jî di tenêtîya xwe de

Li benda ronahîya
Dilê heyvê mam me .
Her şeva ku
Tu dibî şivanê şeva tarî
Ez jî dibim
Bêrîvana heyva ku tu jê re şivantîyê dikî
Bi awazên hestên
Bilûra dilê te di wan şevan de
Ez di xew re diçim
Bi aramîya tenêtîya xwe
Heyv odeya esmanê min dilzîz dike
Û hestên evîna te dil dorpêç dikin
Heyv û stêrk
Şevbuhirka şivantîya te
Bi bêrîvantîya min re
Tameşe dikin
Û evîna xwe
Bi me re dijîn
Şeva ku tu tê de nebî şivan
Şivano
Evîn di hinavê dil de
Kedî dibe...
Şivanê şevê
.....
Ku tu li hespê dilê min



Siwar bûyî
Tu yê di çolistana xurbetîyê de
Li çemekî rast werî
Di binahîya ew çemê
Biçêj xwînê de
Rahêje rondikên çavên min
Û xunava êşikên min vexwe
Bila tu jî bi min re bibî heval
Hevalê yek janê
Jana yek derdî
Derê yek jiyanê
Ew jî jiyana bêkes
Û li wir
Em ê li bazê
jiyana vala derdên xwe siwar bikin
Bi hev re bi fira azadîyê bikevin
Û di bin destbaskên
Welatê xwe de
Venijin
.....
Ji goşeyên bajarê
Jangirtî bihneke dihat
Bihneke mêjîyê min
Tevlîhev dikir
Digotin ku ew
Bihna meya giyanê te bû
Heta ku min
Xwe ji vê
Bihnê
Rizgar bikira
Û
Ber bi bîranînên
Te ve tu carî ku neçûma
Diviya bû min
Di her şev û berbangê de
Qehweya
Jibîrkirina te vexwara
Dîsa jî bihna evîna te xwe ber dida
Kendalê dilê min
Û ez bernedidam
Û bernedam
Va ye dilêşo
Bihna te êdî ji min jî tê
.....

Ba hênik tê
Derya bi dizî dibeze
Pêl bi şermbûn diheje
Dar bi baldarî porê xwe şeh dike
Xweza bi delalî gulîyên xwe
yên nazdarî dihune
Çîya bi hezkirin kulilkan
hembêz dike
Ax bi dilzizî keviran maçîd dike
Çivîk
Bi awazên xuşinîya deryarê re
ketine pêşbirkê
Buhar serxweş bûye
Ez jî bi bîranînên te
re ketime nav buhara
evîndaran.....
Xwezî tu li vir bayî
Û bi buharê re serxweş
Û sermest bibayî
.....
Bagrokeke beloqî
Li ser avrêja tayên porê te re baz dide
Arpijîneke narincî
Di bedena min de gur dibe
Girnijîneke şikestî xwe ber dide
Ser rûyê min
Bihna çîçeka adarokê mêjîyê

Min gêj dike
Dîdareke efsûnî
Bi çavên te re peyda dike
Di her şevê de
Hêvîdar dibim
Ku ez nêzî sînorê bajarê te me
Û bi hilimkirina bihna te re şevê
Li ser esmanê gewre re diborînim
Û stêrkan bi bihna te geş dikim.
.....
Dema ku ez te bi bîr tînim
Agirdûmana bêrîkirinê
Xwe berdide nav laşê min
Dûr be her gav,
Neyê bîra min
Û bi dîtina xwe min
Sirgûnî agirgehan neke
Va ye helbesta ku min ji bo te
Di eywana
Dilê xwe de
Nivîsandibû dişewite
Êdî ku kela bêrîkirina te
Ji nav dilê min rabe
Nikarim bi nameyekê jî
Vemirînim
Ji ber ku ximava
Pênûsa min miçiqiye.
Ew ji bêhêvîtîyê binax bûye
.....
Biçe
Ku daxwaza te çûyîn e
Biçe dizanim tu yê
Tenê bi laşê westîyayî re
Bijî
Di daristana poşmanîyê de
Roj bi roj
Lêvên xwe gez bikî
Û behra êşikan wê li te
Der bibe
Tu yê
Zêmara reşgirêdana
Destmala xwe
Li Mêrdînê de darve bikî
Bes ji bîr meke
Hestên evînokî li dûv te



Sêwî dimînin
.....
Gotinên te di şopên
Rêyeke dirêj de dilukumin
Ne êşê dibêjin
Ne jî evînê
Her gotinek kefenê jibîrkirinê
Li ser dilê xapînok radixe
Û xeyalên ku
Di xewnên bêwext de
Hatibûn jiyîn
Heram dike
Gotinên sexte derbasî
Vî dilî neke
Bila
Ez fêrî qaçaxîyê nebim
Êdî dil bi sînor dikim.
Tu jî di rêya xwe de
Bilukume...
.....
Wê rojek were
Ku pelên êşomayî
Ji dara narvîna rûreş biweşin
Wê hestên hêvîker
Di seqema bayê xunavgirtî de
Biwelidin
Dê xwe di nav nazdariya
Tayên porê şadwarîyê de
Winda bikin
Ez jî
Ji tîna henaseya axîna te
Welato
Xwe ji êşên jiyanê hişyar bibim
.....

Cîhan Hesen, bi rengekî sipehî û bi wêneyên nûjen, helbesta xwe dihûne.
Ji helbestê pê ve, carinan nîvsarên wêjeyî û kurteçîrokê jî dinivîse.

Demsalên ku di bin fîxana dengê dilê te de
Hatine avakirin
Pênc in
Buhar
Havîn
Payîz
Ziviatan
Û demsala ku evîna te tê de
Vejiyaye
Lê hemî jî ne wek
Demsala evîna te ye
.....
Dîsa bû toz
Girîyê di nav çavên payîzê de
Hatina bêwext pelên narvîna rûreş
Di şeva stêrk rijandî de
Pel bi pel sêwî kir
Şirqînîya awirên windayî
Deng veda
Bes hawara dengvedanê
Ji rehjena gihiştina giyanê razayî
Nedihat bihîstin
Di wir de
Govenda xatirxwestinê

Li ber mîrata mirinê
Dîsa destpêkir
.....

Welatekî ku
Ala wî rengên çavên te be
Awazên sirûda wî kenê te bin
Azadîya wî germahîya hembêza te be
Welatîya wî ez be
Û evîna wî jî tu bi xwe be
Ji te dixwazim dildaro
.....
Heger tu werî
Ez ê rengê evîna te
Li hemî wênesazan belav bikim
Ji bo ku tabloyeleke tijî hezkirin
Bi rengê eşqa te çêbikim
Û pê pêşwazîya te bikim
.....
Aniha
Di vê çerxê de
Berîya ku şev bar bike
Û berbang veciniqe
Ka em dengê xwe
Li dîwana Melayê Cizîrî bigerînin
Bi simfoniyeke sofîtî bihêlin
Rîtm bide
Bi xwe re
Ehmedê Xanî
û Melayê Bateyî
ji gornê hişyar bikin
wan jî tevlî zikra evîna şevê
Û jana berbangê bikin .
.....

Ez ê boxçeya derdên xwe
Li pişta vê helbestê siwar bikim
Di şaneşîna nêrgizan de
Bi zimanê êşê
Û bi kezîyên Zînê
Di rihê vê helbestê de daliqînim
.....
Bila carek be
Ew jî îşev
Were
Bêtirs were
Destmêja xwe ji
Bendewarîya min bike
Û bi bayê şefeqê re
Du riketên evînê bike
Piştre biçe.
.....

Xelata Kurteçîroka Kurmancî wergirtiye û di çend kovar û rojnameyan de hêj jî dinivîse.
Berhemeke wê ya helbestî bi navê "Di Navber Şev û Berbangê de" aniha li ber çapê ye

Simbilên kezîyên min
Êdî bi gazincên şevê re xwe
Binax dikin
Şev jî bêriya te dike.

Kultûrname

FOLKLOR

Zeynulabidîn Zinar

Peyvika ”folklor” di nava xelkê de, ji van tiştan re tê gotin:

Li welatekî, di nava gelekî/ neteweyekî de, yan jî li herêmekê, ew çalakiyên taybet ên ku xasê bi wê/wan ve ku bi nêvekarî têne bikaranîn, bi piranî jî di nava wan de ji tiştên mîna çîrok, meselok, stiran, leystik, dîroka devkî, efsane, serpêhatî, destan, henek û laqirdî, gotinên pêşiyan, tore u hwd...re tê gotin.

Lê belê peyvika ”folklor” bi vî hawayê li jorê ku di nava xelkê de, tenê ji van tiştan re tê gotin, ne rast e. Lewra folklor bi wateya xwe ya ferhengî, ji hemû tiştên ku têkiliya xelkê bi wan tiştan re heye re tê gotin.

Peyvika ”folk” wateya xwe bi Kurdî ango gel/xelk, peyvika ”lor” jî bi wateya ”zanîn/zanist”. Îcar dema ev herdu peyvik gihane hev, wateya ”zanistiya gel” dide û di Kurdî/Kurmancî de jî ”gelêrî” tê gotin.

Peyvika ”folklor” cara pêşî li Londrayê sal 1846, ji aliyê William Thomasî (1803-1885) ve di kovara ”Athenaeum”ê de hatiye bikaranîn.

Vî camêrî wek “Folk-lore” bi kar aniye. Piştre jî Elmaniyan peyvika “folklore”yê bi kar aniye.

Hin bi hin ev peyv li dinyayê (xasma jî li nava neteweyên ku zimanê wan Hindoewrûpî ye) belav bûye heta ku ketiye nêva zimanê kurdî jî.

Folklora Kurdî pir dewlemend e. Lê li nava Kurdan pir kêm kes hene ku xebata wan li ser Folklora Kurdî çêbûye. Li Swêdê Zeynulabidîn Zinar 1.710 perçeyên folklorî berhev kirine û di deh cildên XWENÇEyê de dane weşandin.

Li Yekîtiya Sovyetan jî, piraniya zaruyên malbata Celîl (Prf. Ordîxanê Celîl, Prf. Celîlê Celîl, Celîla Celîl) her yekê çend berhemên folklorî amade kirne.

Qunciknîvseke taybet ji nivîskarê Kurd Zeynulabidîn Zinar re ye.

Berhemên Nû

Bi Navê “Stranên Şahî û Govenda Ji Folklorê Winda”…Berhemek li Pirtûkxaneya Kurdî Bar Bû

Berhevoka Lêkolîner û Folklornasê Kurd Salihê Heydo ya bi navê “Stranên Şahî û Govenda Ji Folklorê Winda”, ji weşanên Weşanxaneya DARê li bajarê Qamişlo derket.

Berhema navborî, stranên kenvare û kêmpeyda yên folklor û zargotina Kurmancî vedihewîne. Anku ev berhem ji encama danehev û lêkolînê hatiye berhevkirin.

Di nava pelên evê berhevokê de, nivîskarê berhemê serpêhatî û çîroka her sitranekê nivîsiye.

Ne tenê wilê, lê belê bi awayekî akademîk, li rex her sitranekê awazên wê bi notên muzîkê hatine xêzkirin.

Sitêrname 5

Narîn Omer

Jineke hêzdar, xwedî vîn û bawerî ye, lewra di civakeke tengraman û nexweş de çarenûsa xwe, bi xwe şopandiye.

Hewl daye ku taybetmend û ciyawaz be. Û di demekê de ku civaka me kesên hunermend û dengbêj (Ji mêr û jinan) şermezar dikirin; wê biryara xwe ya girîng, eşkere kir.

Jînenîgariya Wê:

Nisrîna keça Emerê Osman, di sala 1922’yê de li bajarê Zaxoyê ji dayîk bûye.

Malbata wê bi xwe ji Bakurê Kurdistanê ye, lê koçberiyê ew li Başûrê Kurdistanê bi cih kiriye.

Navê “Şêrwan”, wekî paşnav ji xwe re hildibijêre.

Hunermenda me derbasî çu dibistan û xwendegehan nebûye, tevlî vê yekê jî biryar daye ku ew jiyaneke normal nejî, nemîne jineke normal û tenê kevaniya male.

Dema ku dengê wê ber bi zelalî û xweşiyê ve diçe, êdî ew deng dibe nasnameya wê di civaka Kurdî û Iraqî de; ji lew re, dixwaze ku navê xwe di dîroka hunera Kurdî de bi tîpên zêrîn binivîse.

Belê, bi wî dengê zelal ê mîna avzêma solavên zaxo û mêrgên bajarên welêt, tevlî hola hunerê dibe.

Nisrîna Hunermend:

Di sedsala bîstan de Nisrîn tevlî koçka hunerê dibe. Wê hingê huner û mûzîka Kurdî di asta germbûn û bilindbûnê de bûn.

Di Radoyaya Bexdê de, Beşê Kurdî bûbû dergehê navdariya her hunermend û nivîskarekî Kurd.

Nisrînê xwest ku xwe ji dîlbûna çar dîwaran derxîne. Û dengê xwe yê xweş û zelal diyarî gelê xwe bike. Pê re jî razên hinav û dil bi deng û reng bike, û asoyên hebûna jinê ji hest û nest, ji bîranînên çengfirandî yên mîna mebest û daxwazên wê yên bêdawî, bixemilîne.

Di sala 1944’ê de û bi hevaltiya hunermendê kurd Eliyê Merdan, berê xwe dide Bexdaya Paytext û li wir bi awayeke fermî dest bi karê hunerê dike û çend sitranan tomar dike.

Nisrîn, bi sitrana “De Lê Lê” dest pê dike, û bi wê derbasî dil û rewanê gelê xwe dibe.

Pêwendiyên xurt û bi coş, bi pirî hunermendên jin û mêr re girêdide û bi wan re aheng û konsertan li dar dixîne.

Ev pêvajo dom dike, heta ku Nisrîn dibe ji wan hunermendên navdar û xwedî hêz û cihê xwe di dilê Kurdan de mezin dike.

Êdî helbestvan û awazjenên kurd lê dicivin, li ser pêlpêlokên dengê wê sitran û awazan dirêsin û belav dikin, û dilê civakê geş û xweş dihêlin.

Nisrîn bêhtir ji çarsed 400 sitranên cûrbicûr tomar dike; wekî yên: gerêlî, civakî, evînî, cînavî, sirûştî û hwd…, ji xwezeya kurdistanê hest û ramanan dixemilîne û vejîn dike.

Dawiya Vê Hunermendê:

Mixabin, tevlî kar û xebata vê jina leheng di hêla huner, civak

Nisrîn Şêrwan...Afrênera Narvînê 1990-1922

û çanda Kurdî de û dilsoziya wê ji doza gel re; çirûskên jiyana Nisrîn roj bi roj melûl dibin, bêçare dimîne û di sala 1975’ê de xwe ji hola hunerê dûr dike. Da ku bibe dîla her çar dîwaran. Dost, meriv û hezkiriyên wê jê dûr dikevin û di rewşeke derûnî û civakî ya zor de dijî. Bi bablîsoka biyanî û tenahiyê re tê zîvirandin, wekî ku ew, ne ew hunermenda navdar û giranbuha be! wekî ew ne ew dilsoza hêvîdar be!

Nisrîn Şêrwan li xwe û rewşa xwe meyze dike ku êş û jan li can û cendikê wê civiyane, rondikên zuha di çavên wê de diçikilin.

Di 10’ê meha 10’ê li sala 1990’î de, Nisrîn Şêrwan li pêlên mirina bêwijdan siwar dibe û li Bexdê, bê pêjin û bê deng cendikê wê tê veşartin.

Pêwîst e ku gelê me bi awayekî fermî û gelêrî li vê hunermendê vegere, li ser huner û karê wê raweste û mafê wê lê vegerîne.

Kurdî Xweş e

Nojdar	طبيب	Danberhevî	مقارنة	Paşgotin	خاتمة	Dêleşêr	لبوة
Mebest	مقصد	Mandele	انكار	Lêkolîner	باحث	Dêlegur	انثى الذئب
Karvedan	ردة فعل	Berhemdar	منتج	Vebîner	مكتشف	Darizandin	محاكمة
Rûnivîs	نسخة ورقية	Daner	مؤلف_مؤسس	Rahêner	مدرب	Pêşgotin	مقدمة
Şo kirin	زواج	Bîrdank	ذاكرة	Hevsengî	موازنة	Naverok	محتوى

Xaçepirs

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1						■			
2					■	■			
3		■		■				■	
4			■	■			■		
5						■			
6				■	■				
7	■	■	■				■		
8				■			■		
9						■			

Sitûnî

1-Koma bazirganan.Qafîle_Du tîpên wekhev
2-Hindik bi Tirkî_Xweliya tûtinê(Vajî)_Du tîpên wekhev
3-Dijî sitandinê_Welidîna ajalan(Dema borî, vajî)_Du tîpên wekhev
4-Dît devokî(Vajî)_
5-Ji rojên hefteyê_Kûr belavkirî
6-Du tîpên wekhev_Kîn belavkirî
7-Dewsa pêyan_Na bi Erebî
8-Ayîn.Dîn_Yê ji zozanan
9-Teslîm kir

ASOYÎ

1-Embara kayê_Xwarina têrxwê
2-Serbest_ Bêjeya ol+veqetandeka mê
3-Pîn belavkirî
4-Cînavka tewandî ya kesên nêr_Du tîpên wekhev
5-Ewlehî. Hêminî_Pêlav(Vajî)
6-Tenik_Tazî belavkirî
7-Dijwateya hatinê_Bide min(Vajî)
8-Organê bihîstina dengan_Du tîpên wekhev_Na bi Zazî
9-Zêrê guhan_Qatixê ku mast jê çêdibe.

Amadekirina Xaçepirsê: Îsa Bavê Siwar

Peyva Windayî

Da ku tu peyva windayî bibînî, van navan bi awayekî sitûnî xêz bike:

Çikûs_Baran_Kor_Peyman_Azad_Derî_Karwan_Gazin_Zaza_Derwîn_Kezeb_Havîn_Berx_Hawar_Pesin_Bez_Qozî_Çiya_Gorî_Deve

Peyva windayî ji 9 tîpan pêk tê, ew jî navê helbestvanekî Kurd ê navdar e.

k	o	r	î	p	e	y	m	a	n
ç	i	k	û	s	w	a	z	a	d
d	e	r	î	e	b	a	r	a	n
d	e	r	w	î	n	z	a	z	a
q	o	z	î	r	k	e	z	e	b
b	e	z	x	k	a	r	w	a	n
p	e	s	i	n	e	ç	i	y	a
g	o	r	î	c	g	a	z	i	n
h	a	w	a	r	g	d	e	v	e
h	a	v	î	n	n	b	e	r	x

Bersiva Xaçepirsa Hejmara Çûyî

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1	d	a	q	u	r	t	a	n	d
2	a	l	a	t	■	a	■	a	a
3	r	o	z	■	a	r	e	n	m
4	d	■	■	e	m	î	r	k	e
5	e	r	q	■	d	■	r	o	z
6	k	r	a	n	a	b	■	r	r
7	i	■	d	i	y	a	r	■	a
8	r	r	■	■	î	w	a	d	n
9	î	r	a	n	■	î	w	a	d